Em dixwazin rêkûpêkiyê bo Swêdê dabîn bikin – Ji ber ku Swêd hêjayî rewşeke baştir e. Gelekî baştir.

Swêdek heye ku tê da têgeha bêparbûna civakî êdî bûye dîrokek, ji ber ku êdî tu navçeyek li civakê nehatiye bêparhiştin. Swêdek bêyî tundûtûjiya komên sûcdar û desthilata eşîretî, cihek ku qanûn û beranberî hemû kesan digire ber xwe.

Welatek ku dema tu têkiliyê bi Polîs ra digirî, ew tê û di dema girîng xwe ji te venakişîne. Welatek ku tê da gorî tawanbar nînin, ew tê qerebûkirin û berdêla ziyanê werdigirin. Welatek ku dema li derve dimeşî, hesta dilniyayî dikî, ji ber ku sûcdar li girtîgehê ne.

Swêdek heye ku tê da hemû zarok dayîk û bavên xwe dibînin ku diçin ser kar. Li welatekî ku hertim bi karkirinê zêdetir ji wergirtina alîkariya aborî qazanc dikî – cihek ku karker û zekmetkêş hertim li hemberî fêlbazî û sextekariyê bi ser dikevin, û welatek ku tora parastinî û sîstema refahê bo kesên ku pêwîstiya wan pê heye, liberdest e.

Swêdek e ku dibistan cihekî dilniya ji bo zanistê û geşepêdana çîn û qatan e. Li welatekî ku hemû zarok ji destpêkê va zimanê swêdî bi başî hîn dibin. Cihek ku zarok û dayîk û bavên wan destûra xwe hene ku bo xwe dibistanê bibijêrin û heta xwendekarek bi pişkbendiyê cih jê ra nayê dabînkirin an jî bi darê zorê nayê neçarkirin ku siwarê utubûsê bibe.

Swêdek ku tu kesek tê da ji vekirina fatûreya elektrîkê tûşî nîgeraniyê nabe. Welatek ku eger bixwazî bi erebeyê zarokên xwe bigihînî rahênana fûtbolê an jî fêrgeha mûzîkê, bêyî berçavgirtina vêya ku gelo erebeya te bi benzînê an jî bi elektrîkê dixebite, bikarî wan bi erebeya xwe bibî.

Ev swêdek e ku bi enêrjiya atomî ya paqij, elektrîka pak û cîgir û erzan dabîn dike û dawîn hêzgeha elektrîkê ku bi petrolê dixebite, ji kar xistiye. Welatek ku tê da binpêkerên jîngehê divê berpirsyariyê bipejirînin, lê belê dema ku tu kirrîna xwe ya hefteyî pêk tînî, dikarî herî kêm kîseyeke plastîk bi kar bînî.

Ev swêd e ku liberdest e – Tenha tiştê ku dimîne, vîn û hêza bo pêkanîna van tiştan e. Partiya Moderatan anku Partiya Navînrê hem vîn û hem jî hêza xwe hene.

Em bi vê şêwazê rêkûpêkiyê bo Swêdê dabîn dikin.

Kurdiska/
kurmanji

Em bi vê şêwazê ewlehî û dilniyayiyê li Swêdê dabîn dikin:

- Zêdekirina hejmara polîsan û zêdekirina mûçeya wan û mûçeya fêrkirina polîs
- Desthilata zêdetir bo polîs, wek "Navçeya Teftîşkirinê" ji bo wergirtina çekên pirtir
- Şehedên bênav, ji bo ku welatî biwêrin şehediyan li dijî sûcdaran raber bikin.
- Dersînorkirina hemwelatiyên biyanî ku sûcên mezin li Swêdê pêk tînin.
- Cezayên girantir, rakirina daşikandina asta cezayê û hilweşandina daşikandina cezayê ji bo sûcdarên mezintir ji 18 salî.

Em bi vê şêwazê derfetên kar dabîn dikin:

- Kêmkirina bac û sermala li ser kar, bi taybet ji bo derhata kêm û navîn
- Sînorek jorîn ji bo dermaleyê bi awayekî ku hertim sûd û qazanca karkirinê zêdetir ji wergirtina alîkariya aborî be.
- Pêdiviyên beranberî wergirtina alîkariyê ji bo kesên ku dermale werdigirin.
- Kêmkirina bac û sermala li ser meaşa malnişîniyê – Divê bo te were derxistin ku te pêştir kar kiriye
- Serjimariya neteweyî ji bo têkoşîna li dijî sûc û bêparbûna civakî.

Em bi vê şêwazê aboriyê rêkûpêk dikin:

- Na bo bac û sermala li ser heyîtî û xercên din ên malbatan
- Kêmkirina sermala li ser benzîn û dîzelê
- Kêmkirina sermala paşkeftkirina pere (hejmara paşkeftkirina sermiyan, ISK)
- Baştirkirina rewşê û kêmkirina kêşeyên qanûnî bo kompaniyan
- Rêkûpêkî di karûbarên aborî yên giştî da

Em bi vê şêwazê kewşûhewa û dabînkirina elektrîkê rêkûpêk dikin:

- Sermiyandanîn di enêrjiya atomî ya nû da – Erê bo ardûya bêyî fosîl, Na bo gaz û petrola Rûsyayê
- Veguhestina paqij bi rêya enêrjiya elektrîk û binesaziya şarjkirina elektrîkê bo erebeyan
- Bihêzkirina derfeta pêşesaziyê ji bo xurtkirina xwe û hinardekirin bi şêwazekê ku bandora wê li ser keşûhewa kêmtir bibe
- Zêdekirina alîkariyên keşûhewa
- Hevkariya navneteweyî, li ser hemû tiştan li nav Yekîtiya Ewropayê

Em bi vê şêwazê yekparçebûna civakê rêkûpêk dikin:

- Dijwarkirina koçberiyê û dersînorkirina kesên ku destûra wan a mayîna li Swêdê tuneye.
- Rêbazeke karkirinê ya ron û zelal û şertên bilind ji bo fêrbûna zimanê swêdî
- Bijîngkirina zimanî li BVC'yê (Binkeya çavdêriya zarokan) û pêşdibistaniya ziman a neçarî
- Qedexekirina zewicîna di gel kurap/keçap û cezaya girantir bo tundûtîjî û zilmkirina têkildarî namûsperestiyê
- Qedexekirina darizandina eşîretî û yekîneyeke taybetî eşîretşopiyê li nav polîs

Em bi vê şêwazê dibistanê rêkûpêk dikin:

- Girîngîdan bi zanayiyê pîvanbar û terxankirina dema zêdetir ji bo fêrkariyê
- Desthilata zelaltir bo mamoste û birêveberan ji bo parastina aramî û rêkûpêkiyê
- Parastina hilbijartina dibistana azad, lêbelê rawestiyan li hemberî aliyên sextekar û fêlbaz
- Verastkirina ezmûnên neteweyî bi awayekî navendî ji bo pêşîgirtin li zambûna nimreyan
- Pêşîgirtin li dabînkirina cih ji bo xwendekaran li gorî pişkekişandinê û siwarkirina zarokan li utubûsê bo dibistanên xerab.